
# Têkilîya Malbat – Dibistan




Département de l'économie et de la formation
Departement für Volkswirtschaft und Bildung
CANTON DU VALAIS
KANTON WALLIS

SPVal
Société Pédagogique Valaisanne

AVECO

FRAPEVS



# Pêşgotin

## Bi hev re ji bo başîya zarokan

Malbat karê xwe yê bingehîn di warê hînkirin û perwerdeya ciwanan de bi dibistanê re parve dikin. Hevkarîya wan divê li ser bingehê prensîpên naskirî û rêzdar ji hêla herkesî ve pêk bê. Dibistan, ji berî her tiştî, di bin tekstên qanûna dibistanê ya 1962 de bi rêve diçe. Ew di bin çavdêrîya kantonê de ye, lê şaredarî jî xwedî xweserîyeke fereh in. Mamoste jî di awayê xwe di warê fêrkirinê de, bi rengekî ji rengan, azad in.

Ta ku em bikaribin organîzasyoneke ku wek kompleks tê xuyakirin bidin nasîn, divê em erk û mafan dîyar bikin. Federasonyona Romande (fransî axêv) ya Komeleyên Dêûbavên Şagirtan ya kantona Valais (FRAPEV), Sazîya Pedegojîk li kantona Valais (SPVal), Komeleya Mamosteyên Çerxeyên Arastekirinê ya kantona Valais (AVECO) û Wezareta Abûrîyê û Hîndarîyê (DEF) dixwazin prensîpên bingehîn dîyar bikin ta ku hemî hevkarên dibistanê bi şêweyekî lihevhatî ligel hev bijîn.

Fermanên di vê pirtûkê de hatine şûna tekstên di kar de ne nagrin, lê ew wan ji xwe re dikin lêveger ji bo cîbicîkirina çaçoveyeke giştî ya ku têkilîyên di navbera malbat û dibistanê de dîyar dike. Raydar û mamosteyên dibistanê jî dikarin agahîyên, qasî karibin, bêkêmasî bidin dêûbavên ku daxwza wan agahiyan dikin. Herwisa, di derbarê şert û mercên taybet de, ew şîrovekirî di malpera fermî ya Dewletê de ne (https://www.vs.ch/web/se/ecole-famille).

Bi alîkarîya Xizmeta Gel û Koçberîyê (Service de la Population et des Migrations) ya ku entegrasyona koçberan li xwe digere, ev çapa nû li zimanên herî girîng yên civata biyanîyên ku li kantona me cihwarin, hatîye wegerandin. Ew dikarin li ser malpera ku li jor hatîye destnîşankirin dakêşin.

Ta ku hemî dêûbav karibin karûbarê sazî bi giştî û dibistanê bi taybetî baş fêm bikin, pêwîste ew zimanê herêma ku pêşwazîyê li wan dike zanibin.

Herwiha, em tekez dikin li ser giringîya ku Welatê me dide prensîpa xwendina belaş, wekhevîya di navbera keç û kuran de (vegere peymana girêdayî mafên zarokan, https://unicef.ch/international/convention-relative-aux-droits-de-lenfant) û pêdivîya zarok ku herdu dêûbav bi şêweyekî çalak beşdarîyê di hêsankirina têkilîyên Malbat-Dibistanê bikin.



# Struktûra dibistanê li kantona Valais

## Xwendina neçar

Xwendina neçar 11 sal in (polên HarmoS/H) li ser sê çerxeyan (cycle) tê dabeşkirin : çerxe 1 (ji 1H ta 4H), çerxe 2 (ji 5H ta 8H) û çerxeya 3 (Çerxeya arastekirinê, 9-10-11 CO).

| Asta seretayî – çerxeya 1 | | | | Asta seretayî – çerxeya 2 | | | | Asta navîn I – çerxeya 3 | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1H | 2H | 3H | 4H | 5H | 6H | 7H | 8H | 9CO | 10CO | 11CO |

## Dibistana seretayî

| | | |
|---|---|---|
| Çerxeya 1 | 1H - 2H | Herdu salên pêşîn ji xwendinê (berê navê wê dibistana pitikan bû) îcbarî ne. Ew ji bo zarokên ku temenê wan di 31ê Tîrmehê de dibe 4 sal. Qeydkirina zarokan li gorî talîmatên şardarîyê têne şandin an dayîn. Şagirtên 1H û 2H di heman polê de ne (pola bi du Harmosan). Şagirtên 1H bi nîv-dem diçin dibistanê, ango 12 demên ji 45 xulekan. Şagirtên 2H, 24 demên ji 45 xulekan. Dabeşkirina demên xwendinê di rojên hefteyekê de ji berpirsiyarîya desthilata xwecihî ye, û dibe ku ew li gor taybetmendîyên herêmî cuda be. Lêbelê, bi gelemperî ew 4 niv-rojan ji bo 1H û 8an ji bo 2H. Dibe ku dabeşkirina nîv-rojan li gorî rêxistina xwecihî cuda be. |
| | 3H - 4H | Dema xwendinê, ango 28 demên ji 45 xulekan, li ser 8 nîv-rojan ji bo şagirtan têne dabeşkirin. Dibe ku dabeşkirina nîv-rojan li gor rêxistina xwecihî cuda be. |

# Struktûra dibistanê li kantona Valais



| | | |
|---|---|---|
| Çerxeya 2 | 5H - 6H | Hefteyeke dibistanê ji 32 demên ji 45 xulekan pêk tê. Ji bo piştgirîkirina corsên ji bo gellek polan an hejmara mezin ya şagirtan, dibe ku zimanê duyem (Almanî) ji bo komên ji hev veqetandî bê dayîn. |
| | 7H - 8H | Herdu polên dawîn jî ji 32 deman pêk tên. Ji bo piştgirîkirina corsên ji bo gellek polan ou hejmara mezin ya şagirtan, dibe ku zimanê 2yem (Almanî) û yê 3yem (Înglîzî) ji bo komên ji hev veqetandî bên dayîn. |

### Bernameya rojê

Organîzekirina roja dibistanê bi seetên yek perçe, mijarek ji xweserîya Şaredarîyê ye, ew dikare bi rîya seetên yek perçe demên hînkirinê kêm bike. Ew demên hinkirinê bi temamîya nîv-rojekê kome ser hev dike. Bi giştî, destpêk û dawîya nîv-rojekê bo hemî polan lihevhatî ye. Hejmara nîv-rojan li gor şert û pêdivîyên xwecihî têne guhertin. Ji ber sedemên lojistîk (neqlîyat, UAPE Yekîneyên Pêşwazîyê bo şagirtan... hwd.), Şaredarî dikare şêweyên bernameya hefteyê an rojê organize bike û biguhere.

## Çerxeya Arastekirinê (Le cycle d'orientation)

Çerxeya Arastekirinê li ser 3 salan tê organizekirin. Piştî Çerxeya Arastekirinê, ciwan an diçin perwerdeya pîşeyî an jî xwendina normal. Her dibistanekê şêwirmendek ji bo arastekirina pîşeyî heye. Çerxeya Arastekirinê pêşniyar dike ku şagirtan li gor encamên dibistanê yên ku di dawîya Çerxeya 2 (8H) de hatine bidestxistin kom bike. Ji 9 CO de korsên asta 1 û 2 ji bo fransî û matematîkê têne dayîn, pişt re, ji 10 CO de korsên ji bo zanistî û almanî jî têne dayîn. Ji bo hemî mijarên din, xwendekar li hev têne komkirin. Asta 1 hînbûneke kurtir pêşkêş dike. Li gor encamên pêşkeftina xwendekar îmkanên veguheztina di navbera astan de hene




# Struktûra dibistanê li kantona Valais

## Prensîpin din

- Ji bo her polekê mamosteyekî taybet (titulaire) tê destnîşankirin. Ew berpisrê serekeye ji bo têkilîyên di navbera şagirtên pola wî û dêûbavên wan û dibistanê de ye.
- Demjimêr li gor plansazîya xwendinê têne dabeşkirin.
- Heman cihê xwendinê cihê rûniştinê ye jî.
- Xwendinên ku bi rêve diçin ji bo alîkarîya erkên li malê, ji alîyê rêvebirîyê ve têne organîzekirin û ji alîyê mamosteyan ve têne cîbicîkirin. Ev xwendin li derveyî dema xwendina dibistanê pêk tên. Ew ji bo şagirtên Çerxeya 2 û 3 têne pêşniyarkirin (biner. rûpelên 7 û 11).
- Navbeynkarên dibistanê wek kesne-çavkanî kar dikin. Ew beşdarîyê di peydakirina atmosfêreke hevgirtin û rêzgirtinê di nav dibistanê de dikin. Ew soz didin ku rêzgirtinê li sirrîyeteke teqez bigrin.

## Perwerdeya lipê




Ofîsa rêberîya dibistanê û pêşeyî agahîyên zêde dide (www.vs.ch/orientation).




## Projeya giştî ya perwerdeya şagirt di Plana Xwendina Romand (PER) de.

Plana xwendina romand (PER) diyar dike ku divê xwendekar bi dirêjîya dema xwendina xwe ya neçar (îcbarî) li dibistanê çi fêr bibe û asta ku divê şagirt di dawîya her çerxeyekê de (çerxeyên 4, 8 û 11) bi dest xin.


Plana xwendinê komek zanyarî û kanînan ango pêşevçûna ku ji hemî şagirtên xwendina neçar (îcbarî) tê hêvîkirin destnîşan dike, komeke ku li sê sernavan tê dabeşkirin:

Kanînên gîştane (Hevkarî, Ragihandin, Stratejîya fêrbûnê, Ramana afrîner, Ramandin).


Perwerdeya giştî (MITIC, Tenduristî û başbûn, Hilbijartin û projeyên kesane, Jîyana bi hev re û pêkanîna demokrasîyê, Karê bi hev re);

Mijarên dîsîplîner (Ziman, Matematîk & Zanistên xwezayîyê, Zanistên mirovî û civakî, Huner, Beden & Liv);

**http://www.plandetudes.ch**




Ji bo hêsankirina têgihiştina PER, FRAPEV bi rêkûpêk broşûrek j ibo dêûbanên şagirtên xwendina neçar belav dike. Werger jî li vê derê hene: https://www.vs.ch/web/se/ecole-enfantine-primaire-et-co.maire-et-co.



## Şagirtên di zehmetîyê de

Bi şertê teşxîsê ji hêla sazîyeke pispor ya ku ji hêla Wezareta perwerdeyê ve naskirî ye hatîye çêkirin û têde dîyar dike ku şagirt bi nexweşîyên giran an bêmecelên cur bi cur (dyslexie ango zehmetîya fêrbûna xwendinê, dysorthographie ango zehmetîya fêrbûna nivîsandinê, dyscalculie ango zehmetîya fêrbûna hesab, dyspraxie ango zehmetîya liv û tevgera lihevhatî, HPI problématique ango dema ku mêjûyê mirov ne wek yê herkesî kar dike, hwd.) ketine, dikarin ji şert û mercên taybet (tezmînata kêmasîyan) sûd wergirin. Ji bo hînbûn û ezmûnên wan, lênerîn an piştgirî ji bo şagirtên xwedî pêdivîyên taybet, eger hewce hebe, tê pêşkêşkirin li gor pergaleke ku dikare tedbîrên guncav û li gor her rewşekê, bi van awayan:

### Xwendinên çavdêrkirî

(ji 5H heta 11CO)

Şaredarî dikarin xwendinên çavdêrkirî, li derveyî demên polê, organîze bikin. Ev yek dihêle ku şagirt, bi şêweyekî serbixwe, tevahî an beşekî ji erkên xwe yên li malê pêk bîne. Tevî ku hemî şaredarî wan, di asta dibistana seretyî de pêşkêş nakin jî, lê ew, bi gelemperî, di asta Çerxeya Arastekirinê (CO) de bi rêkûpêk û sîstemî têne organîze kirin.

### Xwendinên rêberkirî

(ji 5H heta 11CO)

Xwendinên rêberkirî ji bo şagirtên ku pêdivîya wan bi alîkarîyê heye têne pêşkêşkirin ta ku ew bikaribin erkên xwe yên li malê pêk bînin, bi taybetî di derbarê organîzekirin an stratejîyên wan yên fêrbûnê de. Ev tedbîr li derveyî dema polê tê organîzekirin û dema wê sînordar e. Wek prensîp, ew destûr nade şagirt ku tevahîya erkên xwe li malê pêk bîne.

### Piştgirîya pedegojîk ya ji derveyî dema polê

(ji 9CO heta 11CO)

Şagirtê ku di yek an çend mijarên ku şagirtên çend polan an çend astan li hev kom dikin (disciplines à niveaux) de rûbirûyî zehmetîyên demkî tê an yê ku armanca wî ya gihiştî têketina asteke bilindtire, dikare ji piştgirîyeke pedegojîk, li derveyî dema polê, sûd wegire, bi mebesta ku alîkarîya wî bikin da ku ew bikaribe kêmasîya xwe ya dibistanê dagre.

### Piştgirya pedegojîk ya ji bo şagirtên ku zimanê wan yê zikmakî biyanîye (allophone)

(wek prensîp ji 3H heta 11CO)

Piştgirîyeke pedegojîk ji bo şagirtên ku bi zimanê herêma pêşwaz nizanin, di dema polê de, tê organîzekirin, bi awayê kursên ku armanc ji wan pêşxistina şarezayên danûstandina şagirt. Ev yek dihêle ku ew hînbûna bi zimanê herêma pêşwaz bi lez û bez bişopîne. Ev tedbîra piştgêr, bi giştî, ji 2 salan derbas nabe. Dibe ku notên mijarên şagirt yên ku bandora zimanê fransî li ser wan heye neyên hesibanin.

# Şagirtên di zehmetîyê de



## Piştgirîya pedegojîk a entegre

(wek prensîp, ji 3H heta 11H, ji bilî Çerxeyên Arastekirinê yên di dersên çavdêrê de têne organîzekirin)

Piştgirîya pedegojîk a entegre tedbîreke fêrkirinê ya pispor e, ew ji bo alîkarîya zarokên xwedî hewcedarîyên taybet e. Mamosteyek pispor, di polê de an jî di cihekî dîyarkirî de û di demjîmêrên dersan de, piştgirîya şagirtên di zehmetîyê de dike. Ew bi nêzikayî bi berpirsê polê (titulaire), dêûbav û desttêwedênerên derveyî re hevkarî û xebatê dike. Kontrolên birêkûpêk derfeta naskirina pêşkeftina pêk hatî vedike û li gor wê pêşkeftinê pêdivîyên zarok dide.

## Bernameya guncav (adaptayî)

(ji 4H heta 11CO)

Bernameya guncav ew ji bo şagirtên ku di yek an çend mijaran de bê guncavkirineke taybet nikarin armancên bingehîn yên bernameya dersan bişopînin. Cîbicîkirina bernameya guncav erêkirina dêûbav û herwiha mufetişê dibistanê jî pêwîst dike. Di hindek Çerxeyên Arastekirinê de şagirtên bernameya guncav di polên çavdêrîyê de têne komkirin.

## Dûbarekirin

Dûbarekirin tedbîreke di derbarê şagirtên ku di dibistanê de têk çûne, ango yên neghiştine armancên ku bernameyê destnîşan kirine (navîna koma 1emîn an navîna giştî ya li jêr xala 4an). Ev yek dihêla ku sala bernameyê di dewreyên 2 û 3 de dûbare bike. Dûbarekirina 2H an 3H di rewşên ewarte de mumkîn e.

## Struktûrên piştgirtinê yên din

Ofîsa Perwerdeya Pispor (OES) dikare malbatan agahdar bike di derbarê struktûrên piştgirîyên din ku ji bo zarokên ku zehmetîyên wan hene an jî di rewşa kêmendamîyê de ne: dersên taybet, piştgirîya pedegojîk ya xurtkirî, dersên pêş-hînbûnê, dibistanên pispor, xwendina li nexweşxaneyan.

## Gîşeya tek (Guichet unique)

Her daxwazek ji bo alîkarîyê (perwerdeya pispor, terepîya axaftinê, psîkomotrîk an piştgirîya psîkolojîk) divê bi rêya mamosteyê ku dê form û agahîyên pêwîst bide we, ji rêveberîya dibistanê re were şandin. Pişt re, ev daxwaz ji hêla dibistanê û pisporan ve, di çarçoveya rûniştineke koordînasyonê de, tê gotûbêjkirin. Dûv re, biryar ji dêûbavran re tê ragihandin.

Malpera http://www.vs.ch/web/oes wê li ser alîkarîya şagirtan agahdarîyên zêdetir bide we.





# Berpirsîyarîya dêûbavan

## Dêûbav :

- Bi sazîya dibistanê re hevkarin û rêzê li mamosteyan û karê wan digrin. Herwiha rêzê li rêbazên dibistanê jî digrin,
- eger nakokî hebe, têkilîyê bi berpirsê polê (titulaire) re deynin ji bo gotûbêjkirina rewşê an pêkanîna hevdîtinekê. Li gor rewşê û cewherê pirsgirêkê dê rêveberî, an heta mufetişê dibistanê, werin agahdarkirin.
- Berpirsîyarîya çûna zarokê xwe ya dibistanê di şert û mercên baş yên hînkirinê (paqijî, birûmetî, xew) hildigrin,
- divê eleqedarbin bi tevger û xabata wî ya di polê de û li malê bi dilovanî tevbigerin,
- divê di hevdîtinên ku mamoste/rêverberiya dibistanê amade dike beşdar bibin. Eger hewce hebe, hebûna wergêr/tercumanekî civakê pêwîst e,
- divê ji agahîyên ku dibistan dide heydar bin û, eger bê xwestin, îmze bikin. Wekî din, eger hewce hebe, divê ew xwe agahdar bikin,
- li ser rê û di hewşa dibistanê de li derveyî seetên dibistanê (ewlekarî, reftar, telefonên destan, hwd.) di ber zarok xwe de berpirsîyar in,
- pirsgirêkên tenduristîya zarok, yên ku piştgirtinê pêwîst dikin, ji mamosteyan re radighîn in,
- zarokê xwe li hember metirsîyên nexweşî û qezayan sîgorta dikin. Jiber ku sîgorteya komkî ya dibistanê tune ye. Eger hat û bûyereke qezayê çê bû, divê dêûbav resterast têkilîyê bi kompaniya xwe ya sîgoteyê re bikin,
- mecbûrin her neçûnekê ji dibistanê re ragihînin û wê rewa bikin,
- ji wan tê xwestin ku bi sertî rêzgirtinê li plansazîya dibistanê bigirin. Eger hat û sextekarî çê bû, mufetişê dibistanê dikare cezayan bisepîn e,
- berpirsîyar in ji betlaneyên gerek û berpirsiyarîya şopandina bernameyan bi hevkarîya mamosteyan digrin ser xwe,
- dibe ku ji bo beşdarîya darayî ji bo kampên dibistanê yên bijartî werin gazîkirin,
- guhertina malê di zûtirîn dem de ji desthilata dibistanê re radigihîn in,
- di çareserkirina pirsgirêkên dibistanê de, ji torên medya civatî dûr dikevin û daxwaza hevdîtinekê bi mamoste re dikin.

Dayik an bavê ku desthilata dêûbav di dest wê/wî de nîne, dê ji bûyerên tabet yên têkildarî jîyana zarok li dibistanê were agahdarkirin û ji berî standina biryaran li wî/wê were guhdarkirin. Ew dê bikaribe ji alîyê sêyem yê ku beşdarîyê di lênerîna zarok de dike agahîyan li ser rewşa pêşkeftina zarok kom bike.




# Berpirsiyarîya şagirtan

Şagirt bi alikarîya dêûbav û mamosteyan :

- rêzê li rêgezên dibistanê, mamoste, kesên ku di nav sazîyê de dixebitin û hevalên xwe û herwiha her tiştê ku ji wan re tê peydakirin (avahî, mobîlya, amûr û alav),
- xwedî cil û bergek paqij û birûmet be ku ji hêla Rêgezên dibistanê ve hatî destnîşankirin,
- beşdarî rola xwe wek şagrit bibin, herwiha cihê xwe di hînbûnê û civakbûnê de bigrin,
- bikaranîna alavên elektronîk ji bo mebestên prîvat li hundir û derûdora dibistanê qedexe ne, şagirt dê li humber hevalên xwe yên polê û xebatkarên dibistanê, bi taybetî di bikaranîna torên medya civakî de (temenê herî kêm di navbera 13 û 16 salî de ye û ew li gor tora medya civakî tê dîyarkirin) wê bi guncav û rêzdarî bikar bînin,
- dibe ku bêne cezakirin eger rêzê li rêgezan negrin.

# Berpirsîyarîya dibistanê û mamosteyan

Dibistan :

- li xwe digre ku beşdarbûn û tevlêbûna şagirtan di çarçoveya dibistanê de bide pêş û mafê ku ew nerînên xwe bidin û li wan were guhdarkirin bide wan.

mamoste :

- di erkê perwerde û hînkirinê de alîkariya dêûbavan bike, di heman demê de rêzgirtina şagirt û dêûbavên wî di xema dadperwerî û bêalîbûnê de,
- beşdarî civakîbûna zarok û entegrasyona wî di nav polê de,
- Divê hemî dêûbav li ser karê dibistanê yê zarokê wan agahdar bikin, armancên pedegojîk bi rêya civînên komkî û hevdîtinên kesane vebêjin. Eger hewce hebe, hebûna wergêr/tercumanek civatê pêwîst e,
- bi rêkûpêk encamên ku di dosyaya nirxandinê, rapora dibistanê û berhevokên nirxandinê de hatine bidestxistin ragihînin û dêûbavan bi çalakiyên çandî, werzîşî, giyanî û pêşîlêgirtinê agahdar bikin,
- guh bidin dêûbavan û bi her awayî hewl bidin ku diyalogê bidomînin û bersiva hevdîtinên ku ji hêla dêûbavan ve têne xweştin bidin,
- ji ber disîplîna di hundirê pola xwe de berpirsiyarin û, eger hewce bike, dikarin di hundir û li derûdora dibistanê, hem ji bo şagirtên pola xwe û hem jî ji bo şagirtên dibistanê desttêwedanê bikin. Eger hewce bike, ew dikarin cezayên disîplînî ku di rêgeznamyê de hatine dîyarkirin bisepîn in.
- Berpirsîyarin di ber geşt û çalakîyên di dema seetên xwendina dibistanê de. dêûbav berpirsîyarin di ber geştên tekbitek yên zarokan (rewşne taybet, ser-dana pijîşkî, hwd).





## Xebatên li malê

- Xebatên li malê, dibe ku ji erk û dersan pêk bên, armanca wan xweseriya şagirt bi xurtkirina zanyarîyên ku li dibistanê bidest dixe û berdewamîya têkilî û hevkarîyê bi malbatan re ye..
- Bi hejmareke guncav, ew li gor temenê şagirt têne veqetandin da ku şagirt bikaribe wan bi şêweyekî serbixwe bi cîh bîne.
- Rola malbatan ew e ku çarçoveyeke berdewam pêda bikin, ya ku bihêle zarok karê xwe yê li malê bi cîh bîne, û eleqedarîya xwe jî bo çalakîyên wî nîşan bidin, û başbûna bi rêveçûna karê wî kontrol bikin, bêyî ku bi awayekî sîstematîk serast bikin. Divê dêûbav zehmetîyên girîng yên zarok ku di çav xwe re dikin (demdirêjî, kalîte, zehmetî, hwd.) ji mamoste re destnîşan bikin.
- Li gor rayên berpirsê polê û rêvebirê dibistanê, dibe ku dersên zêde, li gor hewcedarîyên teqezkirî, bêne organîzekirin.


## Proseya bûyerên nakok

- Dive herdem diyalog li pêşî be.
- Beraxêvê yekem yê dêûbavan mamosteyê peywendîdar e an jî berpirsê polê ye. Dibe ku rêverbirê dibistanê û pişt re mufetişê dibistanê, yek li pey yekî, werin gazîkirin.
- Çi nakokîya di navbera şagirt, dêûbav, welî an alîyên sêyem û mamoste de were holê, ji hêla rêveberîya dibistanê ve tê çareserkirin, bi şertê ku serî li mufetişê dibistên bide.





# Tenduristîya dibistanê




Bi rêya xemxwarina civakê, erkê tenduristîya dibistanê ew e ku pêşxistin, pêşîlêgirtin û parastina tenduristîya şagirtan misoger bike.

Hemşîre têkiliya di navbera dibistan û dêûbavan de di dema pirsgirêkên bi tenduristiya zarok û ciwanan ve girêdayî de diparêze. Dê û bav û mamoste dikarin ji bo şîret û agahdarîyan serî li wê bidin.
Ji bo bêtir agahdarî:
https://www.promotionsantevalais.ch/fr/sante-scolaire-460.html

# Çûnûhatina dibistanê

Çûn û vegera li ser rîya dibistanê berpirsiyarîya dêûbavan e. Çûnûhatina bi meş çêtir e. Divê herdem rêz li ewlehî, tenduristîyê û livê bê girtin û ew baş werin nirxanin.

Pedibus (komek ji şagirtan li hev kom dibin û bi meş diçin dibistanê) ji bo çûnûhatina dibistanê di bin rêberîya mezinan de, alternativeke pirr balkêş e. Li gor hebûn û çavkanîyan her pedibusek li gor demên ji bo wî guncav (çûn/hatin, tenê çûn, çiqas caran di hefteyê de…) dimeş e.

Ji bo bêtir agahdarîyan: valais@pedibus.ch ou 076 690 51 68.




Biskilêt û girgirk (trottinette) divê li gor dirêjî û mezinîya zarok bin û alavên wan yên guncav hebin. Divê ku bikaranîna wan li gor şert û mercên trafîka rê û polîsan (kumê parastina serî tê pêşniyarkirin) be.

Di rewşa hin çalakîyên taybet de, mamoste an dêûbav dikarin şagirtan bi wasîteyên taybet (prîvat) veguhêzin, bi şertê ku şagirt li hember qezayan sîgortakirî bin û rêz li rêbazên trafîka rê were girtin : bicihkirina zarokan di wasîteyê de, divê bi rîya alavên gucav be, nabe hejmara zarokên ku têne veguhestin ji cihên ku di lîsansa trafîkê de hatîye zêdetir bin, hwd.
Şaredarî dikarin rênîşandanên sînordartir derxîn in. Divê lêveger li wan bibe.

## Struktûra pêşwazîyê

Pêşwazî û lênêrîna rojane ya li derveyî malbatê dihêle dêûbav kar û malbatê li hev bîne, û ji zarokan re, ji dayîkûnê ta dawîya dibistana seretayî, derfeta ku ew bi şêweyekî komkî di struktûrên rojê yên pêşkeftina zarok xurt dike û piştgirîya wî di fêrkirinê de dike pêşkêş bike. An jî hilbijartina çarçoveyeke malbatî li mala dêûbavên pêşwazîya rojê.
Cûreyên cuda yên struktûra pêşwazîyê :

- Zarokxane : ji dayikbûnê heta 18 mehî, tevahîya rojê, tev xwarinê, vekirîye
- Kreş : ji 18 mehî heta 6 salî, tevahîya rojê, tev xwarinê, vekirîye
- Lênêrîna rojane : ji 18 mehî heta 6 salî, nîv-rojê, bê xwarin, vekirîye
- Yekîneya Pêşwazîyê ji bo Şagirtên Dibistanê (UAPE) : ji 4 salî heta dawîya xwendina seretayî, li derveyî seetên xwendinê tev xwarinê, vekirîye
- Baxçeyê Zarokan : ji 3 heta 6 salî, nîv-roj, bê xwarin, vekirîye
- Navenda Lênêrînê (Halte-garderie) : ji 2 heta 8 salî, nîv-roj, bê rezervasyon ji bo çend seetan, bê xwarin, vekirîye.

Struktûrên ku ji hêla şaredarîyan ve hatine bicîkirin, dikevine bin destûr û çavdêrîya kantonê.

Ji bo bêtir agahdarî : https://www.vs.ch/web/scj/secteur-d-accueil-a-la-journee

# Girêdanên bikêr tên

Federasyona Romande ya Komeleyên Dêûbavên Şagirtan li kantona Valais (FRAPEV)
www.frapev.ch

Sazîya Pedegojîk li Kantona Valais (SPVal)
www.spval.ch

Komeleya Mamosteyên Çerxeya Arastekirinê li Kantona Valais (AVECO)
www.aveco.ch

Xizmeta Xwendinê
www.vs.ch/web/se

Ofîsa Perwerdeya Pispor
http://www.vs.ch/web/oes

Navenda Agahî-Ragîhandin-Teknelojî
https://www.ictvs.ch/

Plana Xwendina romand ya ku ji dêûbav re tê pêşkêşkirin
https://www.vs.ch/web/se/ecole-enfantine-primaire-et-co

Plana xwendina romand
http://www.plandetudes.ch

Arastekirina dibistanê û pîhsayî
www.vs.ch/orientation

Xizmeta Kantonê ji bo Ciwanan
www.vs.ch/web/scj

Projeya Perwede xurtkirinê peyda dike
www.vs.ch/web/scj/edf

Tenduristîya dibistanê
https://www.promotionsantevalais.ch/fr/sante-scolaire-460.html

Struktûra pêşwazîyê
https://www.vs.ch/web/scj/secteur-d-accueil-a-la-journee

Çûnûhatina li ser rêya dibistanê
https://pedibus.ch/coordinations/pedibus-valais/

Broşûra Têkilîya Mlabat-Dibistan
https://www.vs.ch/web/se/ecole-famille

Ji bo agahîyên bêtir yên taybet û herêmî, bi rêveberiya dibistanê re têkilîyê deynin an serî li malpera dibistanê, û her weha rojeva dibistanê bidin.

# Notes

# EDUQUER, C'EST...

...дарить любовь

...сметь спорить

...уметь слушать

...ставить ограничения

...давать свободу

...проявлять чувства

...располагать временем

...поощрить



www.vs.ch/web/scj/edf

CANTON DU VALAIS
KANTON WALLIS

**ООБРАЗОВАНИЕ ДАЕТ СИЛУ**